



SAL : 2  
Jimar: 3

Salname: Newroz I965  
Biha : 2 D.M. Sn Rojava

1

Şoreşa Kurd û Daxwaza Awtonomî bo kurdistana NIVRO (Iraq)

Xwendevanê delal û hêja I

Ev bû nêzîka sê salan ku milletê me ê reben, perişan û bindest cenga azadîya welatî dike. Belê cenga li berdanji ji bona hebûna xwe li kurdistana Nîvro bi hovberên karbidestêne Iraqê re ê xwînmij û kelş re. Di van nersên salên han dê bi nezaran bi-çûk, mezin, pîr û xart ji milletê me xwîna wan bi destêne xwînmijen karbidestêne Iraqê hatin rijandin. Bi sedan Gund û Bajarên kurdistan hatin şewitandin. Bi hezaran mal û xanî hatin sûtandin. Bi Tank, Top, Balfir û Napalm kurdistan qırçık bi qırçık hate wêrankirin. Hovberan weha bawerdikir bi van hovberiyêne nan şoreşa milletê Kurd tarwarî hev bikin û ew careke din kurdan têxin bin koletiya xwe lê beiê novberan xwe xapandin milletê Kurd bi Pêşmergâyên (fedayî) xwe ve bi mîranî nala pola li ber hovberên karbidestêne Iraqê re rawestîyan. Li çarkenarêne kurdistan, Wana li valî li walî leskerên dujmin dane revandin tirs û lerzin xistin dilên wan.

Milletê Kurd her û her amede bû ku vê cenga han bîne dawî, gava ku karbidestêne Iraqê di rîya aşitîyê re daxwazene milletê Kurd bi cî bînin ew jî ev bûn: Awtonomî bo kurdistan û Demokratî bo Iraq bi tevayî. Li ser vê yeka han milletê Kurd ev bû ducar ku cengê radiwestînin. Gava Baas hatin ser hukim wana soz dan ku ew van daxwazene han bi cî bînin, lê piştî dan û standina sê mehan Baasîyan sozene xwe bi cî nehanîn. Wana bi vê yeka han dixwestin xwe bi rengekî xurttir amedeyî cengê bikin. Di dehê Pûşper (heziran) ê de sala 1963 Baasîyan êrişike hovberi bire ser kurdistan û bi hemû rengokî wan dixwest kurdan tevan qir bikin û wan ji rûyê dinê nilînin, ji ber ku ewana tenê kurdin. Careke din gurîna cengê li kurdistan destpêkir, careke din kurdistan bû qada ceng û şer, Careke din kurdistan bû pilingekî ji pilingê agir. kurdan serê xwe netewandin ji dujminê novber re. wan her û her sond û pêyman xwarin ku ew her û her dê li ber hebûna xwe û mafeyêne xwe ên millî *lida*. Durışmê qenremane û penlewan Pêşmerge bû; kurdistan yan jî neman.

Emrê Baasîyan ên hovber bi gellekî ji ê xwînmijê Qasim kurttir bû. kurdistan ji wan nerduwan re bû goristan.

Piştî têkbirîyan Baasîn novber ji ser hukim û hatina Selam Koçeke nû di nava şoreşvanêne kurd û Hukumetê dest pêkir. Careke din ceng hante rawestandin. Dan û standin di nava kurdan û Hukumetê destpêkir. Ev bû nêzîka salekê ku ev dan û standina han dirêj dike, lê hî jî herdu alî negîhan tu vekirinê. Ne hukumet daxwazâ kurdan a awtonomî bi cî tîne û ne jî kurd ji daxwaza xwe dadikevin.

Ma gelo kurd wê çawan ji daxwazene xwe dakevin, ew daxwazene ku bi he-

zaran gorîyên mezin ji bo wan gorî kirine? Iro daxwaza Awtonomî ji bo Kurdistan û demokratî ji bona Iraqê ji ner rojekê din bêtir pêwîsttir bû ji ber milletê Kurd bêyî van herdu daxwazê han nikare mafeyêñ xwe bi rengekî bi rêk û pêk bi karbine.

Her mirovekî welat perwer hêvîdare ku hukumeta Iraqê a nina bi hukmê Awtonomî û bi demokratîyê rûne, da dawîya vê cenga malmîrat bê. Lê gava ku hukumet bi van herdu daxwazê nan rûnenê, bê gotine careke din dê ceng destpêbike û hukumet bi destêñ xwe gora xwe dikole û ew dikeve goreke kûrtir û tektir ji a ku hovê Qasim û novberêñ Baasî ketinê. Weha naskirina demê ji me re dibêje ku Kurdistan bûye ji bo hovberêñ goristan, li şîyarbûna hêzê niştimanîyê Kurd û yekbûna wan.

S O R O

---

### Kurdistan û Serxwebûn

Divê xwendevan, zane û welatparêzêñ Kurd li Awropa û ên ku li wilet çak zanibin ku pêwestîyêñ (wazife) wanen ên mezin û giring hişyarkirin û têginandina netewê(xelk) Kurd bi doza(dawa) serxwebûnêye(başimsızlık). Ji ber ner tiştî divê gelê Kurd baş têbighê ku bi heravayî hêcayê azadî û serxwebûnêye û bi daxwazê xwe bawer bike. Di xebata gelî (millî)de bawerî(inanış) ser li hemû rîyêñ din distîne. Gava kesêñ gel an jî netewekî bi hevdin û doza xwe bawerbin; têkoşîn, yekitî û wekhevî dibe ramana wan û xebata wêna bi rîyek navkirî pêşve diçe. Dema ku kesêñ netewekî bi vî avayî nev ve natin girêdan, nema hêz û êrişêñ neyaren wêna dikarin wê girêdana han a niştimanî (welatî) qels bikin û biqetînin.

Di Sedsalêñ(asır) Bîstan de merov bi ci bawerîya xwe tîne? Divê em vê yekê gellekî xwes zanibin. Wek ku em dizanin, ner demekê li gor çande(kültür) û jîna(yaşayış) xwe bawerîyêñ xwe hene. Demêñ ber dîrokê(tariñ)(li ber bûyîna ISA)de ta vî sedsalê ku em tê de dijîn, bi hezaran bawerî natine, çûne û diçin. Di ner demekê de jî merovan di ber wan bawerîyêñ xwe de xwîn rijandine û newlêdane(cad kirine) ku bi doza xwe bignêñ.

Di sedsalêñ me de nema kes bi galigal, bawerîyêñ bê zanistî(îlmî) û tarî bawer û di ber de xebat û têkoşînê dike. Ev sedsal dema rastî û şîyarbûna gelana. Jiber vê yeka nan divê em jî ner rastîyekê bi çavêkî zanistî bibînin û biaín ber çavên gelê xwe û wan tê bignînin.

Her wekî ku gêtî(dinê) bûye sê kerîyan jî(hêla lêkitîya Sowyet, U.S.A. û ên bê hêl), di nava hemûyan de bo serxwebûna gelan yek rî heye. Ev rîya jî bi yekbûna gotinêñ zaneyêñ cînanê hatîye vekirin û mercen

(şirût) wê hatine danîn. Bi biryarîya(qerar) pêşengên welatan:Divê di netewekî de mercên gelbûyîn nebe û dewlemendîya welatê wî neteweyî besê bike.

Em werin ser mercên gelbûyînê(çawan netewek dikare bi navê gel were naskirin): Di sedsalêن kevn de gel;bi yekbûna zimên,xwîn û ol(dîn) dinate naskirin. Lî niha ev mercên kevnar hatine berdan û ên gellekî hêsan(kolay) têne xwestin. Di vî sedsalê me de,divê bi tenê ew netewê ku di welitekî de dijî,bi dîrokek kevn bi hev ve hatibin girêdan,yekitîya çande û ew kesên wî neteweyî bi dilsozî bixwezin bi hev re bijîn û pêşve herin. Gava ev mercên jorî di netewekî de nate dîtin wek geleki tê naskirin û gava ku dewlemendîya welêt jî bese wan kir,bê gotin serxwebûn dibe mafeyê (neq) wan.

Gava ku em Kurdistanê tev netewê wê^bidin ber çavan û hûr û kûr lê bikolin;emê bikaribin bi nêsanî gelê din tev neyar û gelê xwe qana bikin ku nema netewê Kurdistan bê serxwebûn û girtina mafeyêن xwe dikare bêdeng bisekine û destêن xwe li ber neyar û gelê din nola parsokan veke!

Netewê Kurdistan mercên gelbûyînê deq bi deq anîye ci;ger bixwezin mercên kevnar ger jî ên pêşveçûyî bidin ber destan,em nikarin ku kêmâ-nîyekê tê de bibînin.Yekitîya xwîn,ziman û ol bi tevayî nava wan de heye. Wekî din jî bi dîrokek kevn bi hev ve natine girêdan,di rojêن kevnde ta îro herdem ji bo azadî û serxwebûnê li dijî neyarêن xwe lec(şer) kirine û bi nezaran xortêن xwe kirine gorî(qurban) û şandine dilovanîya Xwedê(renmetê)(şoreşa Dersim,Akrî,Zîlan,Sasun,Manabat û ên din)(Niha jî li Kurdistana Nîvro(iraq) sê salin ku xwîna xwe dirijînine);Ehmedê Xanê,Feqîyê Teyran,Goran û pir nivîskarêن sergevaz li her alî Kurdistan çandeya Kurdî bi karanîne û derxistine;her wana "Komela xwendikaranî Kûrd li Awropa "jî dide xûyanîkirin ku kurdêن her alî Kurdistan dixwezin tev bijîn û xebata azadî pî li pî bikin.Gava ev rastîyêن jorî hatin ber çavan,gelbûyîna netewê Kurdistan bêşoman dê wê naskirin.

Gava ku em bala xwe berdin dewlemendîya Kurdistan;emê bibînin ku ew li nemû cîranêن xwe dewlemendtire. Ne ewe ku bi sedan salin ku welatê kurdan Kurdistan bûye kada(meydan)şer û cengan û ta îro nikariye xwe li êrisêن XWAROKAN biparêze,<sup>II</sup>..... Ger em dewlemendîya Kurdistan û belangezîya(neçarı) gelê wê dibînin,em dilreşîya neyarêن xwe derbekê-re dibînin ku çawan welatê me li xwe re kirine korm û sifre!

Ew Kurdistan ku bi rûnê (petrol) xwe sê gelan(Tirk,treb û Fars)têr dike,ew welat ku tê de madenêن pir bina wek baqir,fosfor,fosfat,antîmoan û ên din ku nêj veşartî di sîngê xwe de diparêze;ew dayika bedew ku bi mîrgeyêن xwe bê jimar dewar li ser sîngê xwe xadî dike;

4

ew can ku bi avê sar û zozanê xwe merovan li ser çiyayê xwe dilşa  
dike û dîsan ew Kurdistan ku dikare her tiştî li ser xwe şin bike çawan  
nikare gelê Kurd netewê ku wê li nemû neyînê xwe bêtir û zêdetir hez-  
dike nikare xadî bike û dewlemendîya xwe bese wêna neke?!. .... Paşê ev  
rastîyek seda sede ku Kurdistan li gor rûniştvanê(nüfus)xwe gellekî  
mezin û firene. Gelo lê hûnê li nerdu çemên(Dicle-Firat) ku di dîrokê  
de bi sedan dewlet li ser hatîye çêkirin, bajar hatine avakirin û bi bê-  
rên (semere) wê dewlemend bûne û niha jî neyarê me li ser leca ben û  
tapan çêkirinê dikine re bêjin ci?.... Bi kurtî merov bi êrişen KWARO-  
KAN ku li ser welatên din ve radiwirin û ta welatê me tê(İngiliz li  
Nîvro) dikare dewlemendîya welatê me K U R D I S T A N bide ber çavan.

Em dibînine ku Kurdistan tev netewê xwe kurdan hemû mercen azad-  
bûn û serxwebûnê anîye cî û Kurd û Kurdistan nema tê girtin û daxwaza  
wan azadî û serxwebûn hatîye ber dêri û wek jinek dunali ku nexwesiya  
kurik anînê pê girtî bûye nema pêsiya kurik dikare were girtin. Bîsti-  
na dengê zarokekî serbilind û hêja li ser dest sivikiya xweşker(doktor)  
maye<sup>III</sup>.....

R E Ş O

## S E H P E H A T I

### Şerê Mêşa

Di mala vî camêri de, piraniya wextê xwe yê panzde rojan, min bi mês  
kuştin û bi mês qewirandinê derbaz kir. Ez derewa nakim gava ez van tiş-  
tan dinivisînim. Binêrin çawan: Di rojên pêşin de ez di oda piçuk de,  
di ya nêzîkî dehlîzê de, radizam. Ev... jî, kurê S... yê navîn, aîngê I7 sa-  
lî, li wê radiket. Di işe bilêta de kar dikir. Lawikekî hurik, bê laş û  
gewde û rengnexwes bû. Lê di karê xwe de sivik, xortekî çav vekirî, mîr  
û kurdperest bû. Evaran, berî ku ez xwe ve aerim, ewî bi pirsên xwe û  
bi şev jî bi xirkira xwe ez gêj dikirim. Dinya navîn bû û serê sibê,  
roj gelek zû hildinat. Berî ku roj derkeve, S... ji bo nimêja sibê radi-  
bû û nema dinat, ev.. şîyar dikir ku nere ji firnê, nanê taxê yê tenik bi-  
kire.

Gava ev... ji xew radibû, derdiket û diçû, ez jî şîyar dikirim. Bi  
ser de jî, derîyê ku dikete rojnelat, vekirî dîniş; bi vî awayî bi tiri-  
jîn rojê ve tabûreke mêsan jî xwe davete nundir. Ji germîya tavê û  
vingavinga mêsan xew êdî mimkin ne dibû. Ez, ningê, radibûm, mêskuja ku,  
ji êvarê de min xistibû bin doşekê, dikire destê xwe û bi mêsan diketim.  
Gava min dawiya wan tanî û ode bi laşen wan radixist, saet dibû şes, şes  
û nîv. Ningê barbar, qîrîn û gîrîna piçûkên malê destpê dikir. Jinek

diçin dibistanê, û ninekan ji li malê pev diketin. Yê hîn di dergûşê de, zarîna xwe diginandin heya ezmanan.

G..., keça S... ya piçûktir, ne bi tenê bi vizvizî, lê qirêjîya xwe ji, ji xelkê malê re raneti ne dinişt. Du salê bû, lê hîn bi xwe ne dikarî û di derpiyê xwe de dikir. Ü pê nev ji dikir. Diya vê ya reben, êdî nedizanî nema xwe pê mijûl bike an kar û şîxulên malê rabe. Carna, piştî guharandina wê bi saetekê, gava dê, li metbexê xwarina xwe danîbû ser êgir û ne dikarî xwe jê dûr bêxe, G... derpiyê xwe ji nûvê dadigirt, paşila xwe bi zoi dikişkişand, diçû metbexê û li dora aê û tencera wê ya li ser "papora" pêxistî ya li erdê digeriya. Diya wê dikir, nedikir, ew ji wê derê bi dûr ne aixist. Rojekê, li ber çavê min, li metbexê, li kèleka beroşa ya li ser êgir, vê keçika ha, bêtirî saetekê dawa diya xwe girtiye, li wê maye û kûziyaye. Edî, we bitîta, mêsên ku lê kom bûbûn, li ser siwar dibûn û laşê wê yê piçûk dinûximandin.

Ji bo merivekî ku li ciyekî welê natîye dinê ku ne bi tenê paqij-tirê Kurdistanê, lê, yê cinanêye; ji bo merivekî ku di piçûkahîya xwe de, li ber destê dîyeke welê mezin bûye ku, ji ber paqijiyê, nexwesiyeke dil pê re peyda bûbû; ji merivekî ku di mala birayekî diktör de mezin bûye ku ji bo ku wan nînî paqijiyê bike, li nekweşen xwe dixist; ji bo merivekî ku bi salan ve li Swîsrê maye, ji bo merivekî ku ji piçûkiya xwe de, berî ku xwarinekî bibe devê xwe, mîna kûçika, ew bênn kiriye, ev dêmen (menzere) û ev bênn ji mirinê dijwartirbañ.

Lê, ji tirsa ku ez wan bîxeyidînim, min dengê xwe ne dikir tu tişt ne digote wan. Ü gava li ser sifre, xwarin datanîn erdê, û G... şûştî û bi cilêن gunarandî, di nimbeza dê an bavê xwe de rûnişt, bi xelkê malê re, bi hevre, bi dîlxwesî, min zikê xwe xwes têr dikir.

Lê, berî ku xwarin pêk bê, ez diketim oda navîn, a me tê de dixwar, û bi seatan, min xwe bi kuştina mîşa mijûl dikir. Carna, min ji wan du, sê heb bi derbekê tanîn xwar; ningê, wek "Qeshmerekî" qehreman, min ji S.. an ji jin û zaroyê wî re digo: "Dilê xwe ges bikin, ka ji we re çend 'Ba'asiyê' sekiti !...."

Hingê, li şamê bi tenê rojnameyek derdiket, ew ji ya Ba'asiyan, Ba-as bi xwe bû. Her ro, piştî nîvro, S... hêjmarek jê min re tanî. Tiştên vê rojnameyê yîn bas ev hênd bûn ku davêtin Cemal Evdinnasir. Nivîsandînê wê yên din ne dinatin xwendin. Berî ku pał dim û dest bi xwendina wê bikim, midetekê, ez dîsa bi qîr kirina 'Ba'asiyan' xwe radibûm.

F... keça S... ya mezin, xudiya oda navîn, hez ne dikir ku ez xwîna wan li ser çerşefîn textê wê yên spî birijînim. Lê min bi ya Wê ne dikir. Ji lewre, carna ji min aciz dibû, ji odê derdiket û diçû, li derve, bi-dengekî bilind, dilmayîna xwe ji min re dida gîhandin. Lê min gun ne

6  
didayê, ji ber ku, ji min ne dinat ku ez wan berdim, ji destê min bifili-  
tin.

Bi qelendina wan ne bi tenê laş, guh û çavên min ranet dikir, lê we-  
te dinatê min ku, ev mêsên ha, li ber çavên min, bi rastî bûne "Ba'asîyê"  
bi goşt û gewde. Bê nemdê min, bi kuştina wan bênnâ min derdiket û dilê  
min pê geş dibû. Di vê midetê de, di şerê mêsan de, min du mêsukj şikê-  
nandin...

#### D E R K E T İ

P.n.: Di sala 1963, mëna Gulanê de Ba'asî, piştî ku navê min danîn ser  
"Listeya reş" natin ku min biçrin. Ez ji destê wan filitîm û berî ku  
birevim, bêm Lionanç, ez li Şamê du meha veşartî mam. Di vê midetê de,  
ez bûm mîvanê 5 malen Kurden camîr. "Çiroka mëşa" li mala S... derbaz  
bûye.

#### Kronolojîya Nivîskarêñ Kurd li Kurdistana B A K U R

Weke ku hûn xwendevanêñ me ên delal dibînin, iro "Hêviya Welêt" bî  
rengekî nû û çaktır di destêñ we de ye. Li biryariya komîtîya wê divê  
em mezinêñ Kurdan ên dîrokî bi xwendevanêñ xwe bidinî naskirin. Li ser  
vê yeka han ez jî dixwazim bi kurtî, li gor destketîyêñ xwe nivîskarêñ  
Kurd ên Kurdistana Bakur di rojêñ dîrokê ên kevn de bigrim ta sedsalê  
I8 bi we re bidim naskirin. ner weki ku ai sedsalêñ I8 de ta iro gellek  
nivîskarêñ aengdayî nene jî, pewîst nabînim ku navêñ wêna di vir de bi-  
dim der. Ger nûn rê biain, emê wana jî li dîrokê re berdin.....

1) Melayê Cizîrî: Di sala 1002 de li Cizîrê hatîye gêtîyê(dinê).  
nelbestvanekî(şair)panteîste. nevalê çergui apê Selahaddînî Kurdiye.  
Selanaddînî Kurdi jî pê geillekî şakir bû û lê pir hezdikir. Li Iran û  
hojnîlata Navîn gerîye. Zimanêñ Erbî, Farisi û Tirkî xwes dizanî û ni-  
vîsarêñ xwe nemû bi kurdi dinivisi.

2) Elî Herîrî: Di sala 1009 de li gundê Herîrê bûye. Herîr, yek li  
gundêñ bajarê Bitlisê ye. Di dema wî de Merwanî karbidestêñ welêt bûn  
û Dîyarbekir ji xwe re kirî bûn Serekbajar. Nemû nelbestêñ xwe li ser  
evînê (şeqê) nivisîne û dîwanek xwe jî mezin heye. Di sala 1079 de çû-  
ye dilovanîya Xwedê.

3) Feqîyê Teyran: Di sala 1302 de bûye û 1375 de jî çûye dilovanîya  
Xwedê. Yekemîn nelbestvanekî ateîste di dîrokê de. Ta wê demê kese-  
kî nola wî ne hatibû dinê.

4) Melayê Batê: Di sala 1405 de çûye dilovanîya Xwedê. Bi helbes-  
têñ xwe ên Olî (aînî) û bi mewlûda xwe dengdaye. Di dema derebekan de  
dijî. Li gundê Batê bûye.

5) Şerafettînî Bîtlîsî: Di sala 1542 de natîye dinê. Bi nivîsandîna şerefnamê deng daye. Di sala 1594 de dest bi nivisandîna wê kirîye û 5 newroz (mard) 1597 de dawî anîye. Şerfname 5 kerine û di sala 1862 de li Sempetersburg (Leningrad) bi destê endamekî Çarî hatiye guhar-tinî frensî. 3 pirperin(cild) û 2500 rûpelîn. Kerîyê yekemîn, çêla dewletên Kurd ên serbixoyî(misteqîl) dike. Ên dunemîn, çêla dewletên atonom û ê sênenemîn(sisiyan), qala begligan û ên 4-5 jî bi dirêjayî qala jîna eşîret û rewşen (nal û durum) kurdan dike.

6) Ehmedê Xanê: di sala 1591 de li gundê Basîtê bûye. Basît, di mabera Bîtlîs û Cizîrê de ye. Gava çel salî bû hem û Zîn nivisandîku di gêtîyê de aeng daye. Ew pirpera nemû nelbestî natîye nivisîn. Her waha lûgatêk Kurdi-Hrebî jî pêk anîye ku 2000 ûşê (kelîme) tê de hebûn. 10 salan di Sereya İran de maye û tasawufa wan çak kolaye. Bi xwe hezkarê mizgeftan bû û gava ku vegerîya Basîtê bi perêx xwe dibistanek (mek-teb) vekir û bû mamusta (nînkirvan, muclîm)ê wê. Xwadîyê rihekî nas-yonalîst bû. Bi nêla olê ve jî nelbestên lîrîzm dinivîsi û bi nêla tasafufê jî pir kûr bû.

7) İsmailî Basîtî: Di sala 1642 de li Basîtê bûye û sala 1707 de çûye dilovanîya xwedê. Nivîskar û nelbestvanekî nasyonalist bû.

Xwendevanên delal ! Ez gellekî ber xwe dikevîm ku min nikarî li vê zêdetir binivîsim. Nêviya min ewe ku em nîn bêtir li we bibîzin û ger ku şasîyên min nene divê nûn bi kerema xwe me re ronak bikin û me bi alikarıya xwe destkewti bikin.

R.E. §. 10

### Çend nelbestên Biraderan

#### Rojî keşî şeşî Lylul

Paş cengî cihanîy yekem ta şorişî çardey temuz 1958, deiî Kurd le kurdistanî xwarû (Iraq), le pênavî sendinî mafî zewtkirawekanî da, be gelêk raperîn û şorişî xweñawî neisa.

Yekêk lem raperînane raperînî şeşî Lylul 1930 bû le Silêmanî. Lem roje da gelî Silemanîy nebez be gewre û piçûkewe wirûja û ser şeqeme-kanî şarî girt. Nemû pir be dem nawaryan ekird: "Eme Kurdîn, Kurdman ewê".

Belam nikumetî koneperistî 'Iraq' be han û yarmetîy Ingilîzekan be gulley tifeng û reşaş kewte gyanî xelkeke. Be dehan ku, ran û birînaar kiran, desehe gîran û xirane bendîxanewê.

Kecî paş em kujtare hendêk le noker û bekiregirewеканî ew dewre nelsan û çûne Bezda, bo kîrnûş birdîne berdemî Feysel î yekem.

Pîremerdî xwalêxoş 'bû' ke ew û deme kurdâyetyî ekird, der barey em  
 wefde be beriye le Kurd û Kurdistan em heibestey xwarewey wit;  
 Wetaî Kurdistan, milet firosan  
 Herze wekîlî şarî xamosan  
 Biybene berdem erşî 'Iraqî  
 Bilîn yar baqî nem sunbet baqî  
 Dek xecâlet bin le rûy mehşera  
 Emî xakî xem ekeyn, be sera  
 Kurd nabrîtewê xeyali xâwe  
 Beratî necat be xwêñ nûsrâwe  
 Be' derbederî ya le malî xom  
 Le xakî 'Ereb'le Eran û Rom  
 Danişim le ser textî xunkari  
 Ya le kolanan bikem nejarî  
 Kurdim û le rîy Kurd û Kurdistan  
 Jiyan le pênav, gyan le ser destan  
 Be kurdi dîsan zinû eb'mewe  
 Lew dinyaş bo Kurd tênelec'mewe.

Çepkê le gûlî baxekey sera  
 Ke be xwêñawî lawan aw dirâ  
 Perde w taray sîr berin bo Emîr  
 Bilîn dway kuştar hêsta toy dilgîr  
 Ewe ew erşey be xwêñ gulrenge  
 Sucdî bo eben niç nalêñ nenge  
 Min rîngî sûrim boye xoş ewê  
 Mijdey şefetî lê der ekewê.  
 Kemal Fuad  
 (Di kovarê Kurdistan, salê I96I de)

---

Kok û poşte bim, rût û recl bim  
 Koşkim de-qat bê, wêrane malbim  
 Azad û serbest, şadan û xendan  
 Ya zincîr le mil le suçî zindan  
 Be kurdi ejîm, be kurdi emrim  
 be kurdi edem weramî qebrim  
 HÊJAR  
 (K.Fuad di K.Kurdistan de sala I96I)

---

Xwendevanêñ delal, bi biryariya komîta kovarê divê em vir nada  
 çend rûpelîn kovara me ji brayêñ ku zaravayê Soranî dipêyivin vejetî-  
 nin ku ev ji pêşketinek çake. Jiber ku brasoranêñ me bi latînî nizanîn  
 binivîsînin, em ji bo nêzîkbûna herau zaravayêñ kurdi vê yeka nan pir  
 pêwîst dibînin û nina de dilxwesîya xwe pêşkes dikan.  
 Şewaş ji Xwedê

Hatim dinê, bi kurdi; geilek spas.

Dijîm, bi kurdi; berxudarbî.

Şîyar bûm, bi kurdi; şewaş ji te re.

XXXXXX

Dixwum kerşît, û safî; dewê tirş bi tas..

Dimeşim bi lingên xwasî, dilxweşim ya Rebbî.

Paşê bimrim bi Kurdi, şewas ji te re.....

R E Ş O

Marşa Xortê Kurda

Rê vekin<sup>I</sup>, vanê ku têx körte Kurdanin<sup>I</sup>,

Me mil dane nev mîna çîyayê dûman.

Dengê mîna çemênu xuşa giranin.

Rê vekin<sup>I</sup> derket pêşîya ordiya can<sup>I</sup>

Em davêni ji weten emperialîstan...

Em pale, gundi, em xwendî, em proleter,

Hember dijminê merûtiyê em siper<sup>I</sup>.

Em nezkârê ediayî, medeniyetê.

Bazdin kedxur, zalim ji ber lingê Kurdan<sup>I</sup>.

Em davêni ji weten wan kolonyalîstan...

Girî, belengazî û koletî bese,

Xwîna kalikêne me li me mîze dike;

Ewê ku nakevin nîv şoreşê ne kese.

Rê vekin, rê derkevin<sup>I</sup> va şerek teke.

Ji weten em davêni kolonyalîstan<sup>I</sup>.

Dîrcka me a berez nerkes dizanî.

Hejar bibin, cî bigrin nik şerêd biran<sup>I</sup>.

Ji berê de îşê me bûne mîranî...

Bazdin mustemlekär ji ber nigêd Kurdan<sup>I</sup>.

Bavêni ji weten van emperialîstan<sup>I</sup>.

Hev civîne Manabed, Erbil û Bitlis

Mîna zimaged merxan li pişta Suphan.

Kalîna berzan ket dû dengê şêrên sis<sup>I</sup>.

Rê vekin, xof bikin, tê ordiya Kurdan<sup>I</sup>.

Em davêni ji weten kolonyalîstan...

M. B O R

Sibê livîya bajarê Mixribîyan;  
 Çawa çemê wê baharê digirmîyan,  
 Usa qûrtîn ket nav taxa, kûça, banî:  
 Bijî<sup>I</sup>. Bijî<sup>I</sup>... Kî bijî? Bijî AZADÎ<sup>I</sup>.

Derê baxçê binarê ve bû hêdîka;  
 Gul, rihan, newroz dinêcînin bêcika;  
 Bilbil distrînin cem xezal û berxika...  
 Bijî<sup>I</sup>. Kî bijî? Bijî omidê daka<sup>I</sup>.

Dewra berê Kawa şoriş saz kir hember  
 Zaliman û miftexuran. Mezin bû şer.  
 Milet pêl pêl ket dû Kewa mîna ordî;  
 Kenîyan kole: Bijî, bijî A Z A D Î<sup>I</sup>.

Kawa hesincî, Kawa emektar; na, şer.  
 Xudan ser hêniyê de dimeşî nêre nêr.  
 Xelk dimeşî bê rim, bê mertal, û bê şûr...  
 Bijî das, çekûç<sup>I</sup>. Bijî xudana kûr<sup>I</sup>.

Dewra berê, berê; wê roja biharê  
 Li ezmana qertelek digerî sibê  
 O erdê nezaran qertel çûn serayê<sup>I</sup>.  
 Hevalno naydê<sup>I</sup>. Bijî xelkê mîna bê<sup>I</sup>...

Egîtek erdê ket ber kanîyekî :  
 "Min derbazbin<sup>I</sup>. Guh nedîn birîndarekî<sup>I</sup>."  
 Ket nav, nav avê xwîna germe nermê sor...  
 Bijî<sup>I</sup>. Bijî daîmî qurban<sup>I</sup>. Bijî dor<sup>I</sup>.

Lanet sultan Zuhak<sup>I</sup>. Lanet sultanan<sup>I</sup>...  
 Milet çilmisand sef baş text û tacê wan.  
 Dil, dil nav baxçê binarê de, binarê de...  
 Bijî rinê Kawa li Kurdistanê de<sup>I</sup>.

İro çawa berf dinelê serê çîyan,  
 Usa jî kolonyalist ji welatan  
 Têr raqetandin... Torinên Kawa hijarı.  
 Bijî, bijî her Kawa her milêtî<sup>I</sup>.

X W A R O K

Dixwestin bi hevalbin

Yek li wan min ê din gur.

Tev bijîn wek birabin

Wekhevî kirin destûr.

Bi telaqan sond xwarin

Soz û bîryar hemû rast;

Her avayî bin barin

Ger ji sozê vegeerin...

Mih diçêri têr û xwes,

Jiber welat ê xwe bû,

Doş dibû newal û kaş

Ber ku neyar heval bû.

Netewitî dilê gur

Xinizi û bê sinçî,

Bel dikirin çavên sor;

Bû raman nêz û birçî!

Li ser avê kirê taw,

Got "şêli bû avzelal".

Ew biratî kire kaw!

Jîn bo min nebû Helal....

Minê gotê"ho dilresî!

Tu zanî nustî kurtim,

Bê xistina lingân pêş

Nikarim avê vexwim... hêvî dikim kûr nebî,

Av dimeşê serberjêr.

Berve te nê şêlitî,

Diranên xwe meke kêr!!

Gur bersîv da kurtebir.

"Rast dibêjî ên dûr û sir

Lê nabînî dûr û sir,

Ger jêr bûma no bêbav!"

Guhnedayê bê gotin,

Min çengand rast û çep;

Dil kezewê wê sotin

Çav ji hev û ling jê rep.

Divê em bîra nebin

Xwarokên me gurbira!!!....

Tucaran rast nameşin,

Ewana G U R, G U R B A V I N!!!!....

Dibêjin wefdeke Kurdi!  
 Li ser zînat û sitemkariya Ecem  
 Nivîsareke dûr û dirêj,  
 Li Parîsê daye sekreterê Hêyeta Umem!..  
 Tê de bi ser û ber kiriye  
 Qêla bisernatiya kuraên Ciwanrû,  
 Ku nînde jê natine kuştin...  
 Jin û zav û zêç ji ber lingan çû...  
 Ma kînga neq tête dayîn..Ho?!

Heke xwedî neq ne dest bi dar be,  
 Ola wî kirin û mirin,  
 Dilpola û gurçikzinar be.  
 Di navbera daxwaz û daxwaz de,  
 Ferq neye ji erdê neya bi ezaân  
 Reben û parsek têr qewitandin  
 Her dem natiye nasîn neqê xurtan.  
 Qelsî, riya mirin û winda bûnê,  
 Mirinek kirêt, windabûnek bê doz...  
 Çi gelê xwestiye aza bijî,  
 Xwe daye nasîn bi zaravayê Bahoz...  
 Heke we divê neqê xwe bigrin,  
 Zûka destê millet bîgnînin dar.  
 An na, dengê me nayete binîstin,  
 Dê bimînin şerpeze, bindest û bêwar...  
 Agirê serxwebûnâ milletan,  
 Divê xebateke xurt û gelêr û yekrû.  
 Tenê bi pifkirinê vînakêve,  
 Jê re dixwaze gelek êzing û ardû..  
 Araûyê vî agirê nan,  
 Divê em bin, ho..Kurdên camêr û bi rûmet!  
 Mirin û heps û birçî bûn..  
 Divê ji me re bibin wek cêjn û dawet.  
 Gava me xwe ji vê da paş,  
 Dê çawa dengê me bigêne cihân?  
 Bê şerr û gelş û qirrên û lêdan,  
 Lingê me naçe nav axa Kurâistan  
 Cinê ku fro em Kurd  
 Ji bo Ciwanrû bibin piştêm û gazî,  
 Bi top û tifing û şûrê tazî.

Ne herwekî qels <sup>13</sup> û rebenan,  
Tenê çav bidin peyv û gili û gazin..  
Mehder û alîkarî û pûştmêriyê,  
Biçin ji zorker û rêbirran bixwazin!..  
Ma kî ye ew civata milletan?  
Ew in şandiyên çend dewletên kolîdar,  
wan li dora xwe civandine  
Peyayên milletên qels û reben û jar.  
Herwekî ew dixwazin  
Ji xwe re hin qanûn û rêzan dänîne,  
Naxwazin rastiyê binasin  
Ola wan, zor û zînat û pêkarîn e  
Rê û doliwa cînanê,  
Goreyi kar û aaxwaza xwe digerrin in!  
Çi rast be, çi derew be,  
Milletên biçük li pê xwe radikşin in...  
Bi navê neq û aadimendî,  
Tovê şerr û zînat û jellaciyê çandin..  
Kesê ku qîma xwe pê nanî  
Bi ser de guile û bombe barandin!..  
Heke ev ne welê ye,  
Çawan Firansiz bi tang û top û tifingan:  
Welatparêzên Cezairî.  
Dikujin û dipeçeqin di bin lingan!..  
Ma ji bo çi ew Koma rêbirran,  
Dest nađe ber darê sitema zorker?  
Heke wê qanûn û rêzan hene,  
Çimâ danade dergenê kuştin û şerr?!

Ma ne ew Koma qeşmer bû ku,  
Leşkerê xwe dişand şerrê Korya?  
Da ku bi zora dar û tifing,  
wan têxin bin destê maldarêن Emerîka.  
Heke ranebûna Maw-Sî-Tong,  
Serdarê Çîna gelêr, ew pilingê zer;  
Dê Korya tev bibûna Kolî,  
Tê de aza nediman tu cin û dever...  
Ji nêla din Hina-Çîni,  
Dema xwest pibe sorxwe û aza;  
Bê ku bazgûrô kesî be  
Ajote ser kolîdar wekî Baza.

Qet nedinate bîra wan  
 Ku tu rojan bi lavayî û berger û gazin,  
 Ji wê koma rêbirî û nemerdan  
 Serxwebûn û azadiya xwe bixwazin.  
 Bi şerrê Diyan-Biyan-Fû,  
 Û berî wî bi gelek şerrên xwînrîz û giran...  
 Şikandin serê kolîdarê pîs,  
 Bê nav û rûmet kirin di nav cihan.  
 Ji hemî milletên bindest re  
 Rave kirin riya serbestî û azadî,  
 Ku bê kuştin û mirin  
 Kes nagenê warê rûmet û şadî.  
 Berî vê bi çar sed salî  
 Zaneyê me Kurdan Enmedê Xanî,  
 Riya felat û azadiyê  
 Ji gernasên îro pirr çêtir dizanî  
 Dibêje:"Nedîn bîra xwe ku,  
 Bê ceng û têkoşîn û sergermî!.."  
 Ma welat tên sitandin,  
 Bi bergerr û lavayî û zärnermî?!.  
 şerme ku em xwe deynin,  
 Bazgûrî zorkeran bin' û bibazin.  
 Heke em dirêjî mirinê nekin  
 Wek lokê nar û hêc û girçîn,  
 Çawan dê bikeve adestê me?  
 Welat û rûmet, serbilindî û jîn..

## XXX

Ho...Xortê Kurd ê hêja!  
 hêviya gel û welat û welatiyê min..  
 Kabe bi merdî serî hilde,  
 şerm û finête ji bo te fidî nivistin.  
 Kurdistan, wa ye gazi te dikê,  
 birû wek şîran biçe newar û gazi..  
 Bavê te, dema mirinê  
 Ji te re niştî bû şûrekî tûj û tazî..  
 Lî tenê ji ber qelsiya te  
 wî şûrî girtîye qirrêj û pasik û jeng!  
 Di nava gelên cinanê de  
 Tu tenê ma ye bû nav û nişan û deng...

15

Wekî mîran dest bibe xwe  
 Wî şûrî nilde rast û çep dawesîne,  
 Lend û Kemendêñ di dest û lingêñ Kurd  
 Pê bibirre û bi carekê bişkêñîne.  
 Gun mede gotinêñ qelsan  
 Dê wek tiryaq laşa te bitevizînin,  
 Nevaliya wan şermisarî ye  
 Dê renêñ mîraniyê di te de bimirînin...  
 Derdê te mezin; lê ne bê dermane,  
 Birîna te bêteşe, geleki kûr...  
 Ji min bibnîse şîreta biran  
 Te nînin derman, bê tifing û şûr.  
 Neke neyarê me yê zorker  
 Çiqasî xurt be, xudan keşti û leşker,  
 Bê şivisk dê zora wî biçe,  
 Neke di nav me hebin sergevaz û rîber.  
 Ez bawer im ku nûn xortêñ Kurd.  
 Li bende kêsa xwe mane rawestî...  
 Dê hemin serê xwe nîldin  
 Qet bi we naeve ev qelsî û bindestî!  
 Ez bi hêviya wê rabûnê,  
 Bûn sî sal naxwazim dûrê xwe bavêm;  
 Neke bi rûmet û azadî ne be,  
 Ez vê jîna aerbeder û bindest navêm.

O S M A N S E B R İ

(Di kitêba Banoz de sala 1956)

---

A X A W E L A T

Ax, ax!

Axa welat,  
 Şîna xebat;  
 Tu bûye par  
 Bin destê neyar!..

Tu evîna me

Evîna gîran,  
 Ji me bûye par  
 Bo herçar biran!..

Dayika bedew,

Ji ber çavêñ me  
 Dest avêtin te!  
 Nizm bû serêñ me,  
 Em mane bê ar!..

Axe welatî,  
Kada felatî  
Hati istiran,  
Bi xwîna lawan!

Niha vedirşî  
Nêm û xwîna me,  
Li şêlmc û Tatwan!

Ew petrola nû û xwîn  
Neyar kirin nar û dîn.  
Pê têr dikirine,  
Tank, çek û balafir,  
Li ser lawen te de,  
Dikine ew zire zirri.

Daka Kurdi  
Meçirîne sîngê gewr,  
Bitewîte wek beret.  
Veşartîbe wek cewher,  
Em hatine per seret.

Me dane nev nerçar dest  
Tu şâ bibe bigre şert.  
Bi mîyonan rûniştvan,  
Dijîn ser pehlewan;  
Kurê te ê serkevin  
Ev rastîye sed û sed....

R E S O

### N O S Y A M I N (wasîyet)

Wê çaxa ez mirim,  
Hün bi dil û gurçiyê min Silêymanî yê de tiştekî bikin;  
Ne bigrin, ne jî bitalin...  
Ez hejarim, diravê min tunîne;  
Lê kincen min bavén bin higan;  
Röwi bire pêlî wan bikin û wer derbaz bibin...  
Ser binivîsin tenê.  
"Vana çeked wî merovîne, ê ku gerîya dû wetenê  
"Bû teresî, bê zalim, bê xwîn, oê girî..."  
Neyîtê min bişewitînin ser çiyayê Suphanê;  
Xwalîya min bavén ber bê çardcr:  
"W bire rind bela bibe li vî welatî...  
Ne bigrin, ne bitalin, ne jî biqîjin!  
Qutî bikin, cişarekê hiksînin tenê...  
Hesikîya giştina zeviyê,  
Runenîya çavêd min bikin bin bîyekî  
Ma TOR'da kêleka kanîyekê.  
Rojed navînê nêlûna teyra dorc hebin rinde,  
Ma tuncbin, ez ci bikim, hûn ci bikin?

Bang Xwedê ne bikin! Ji Isa nezâr û nensed salî..şûnva,  
Tutist ne bêjin wê daka mina dinra...

M. B O R

### ÇIROK

### D I Z O L A W I K

-Gelo ez vi zêri jî bigrim an na?  
Payîza paşin, baran nûrik hûrik dibarî...

Nîvê şevê derbaz bûbû. Tarîyeke qalindî kûr bajar zeft kirî bû. Tarî sultânê wê gavê bû. Çavan çav nedîtît. Ezman û erd hev qelivibûn. Sînor hîç tunebû. Banî, dîwar, pencere, derî, hûstînên têlgraf û telefon, baxçe..Hîç, hîç tiştek nedihatîn naskirin. Taxe û şeqem herkes bûn, tenê car li caran dûr, ye an dengê dîkekî, an jî qîjîna pîpîka payerên (nöbetçi) taxa dihatîn û nav xûşîna baranê de dineliyan, ûnda dibûn. Ox, xûşîna baranê, çiqas xweş û delal bû!. Nizanim, gelo we bin baranê de deştekî de hîç rîwitî kirîye, an na? Baran çawa deşte de ser pelax, gîya, qûm û keviran de xûşîneke kûrî qalind derdêxe; ûsa jî niha vê demê de ser banî û nav şeqeman de dixebeitîn... Ger helbestvanek, xwadiyê mîji, wê derê amedebûya, wî dikarî derheqa zûlmetê de helbesteke bê mirin biafiranda, ger resamekî unacî mezin bixwesta bedewîya zûlmetê resmîkî bixwesta kilamekî ebedî, dengekî bê mirin bixûlkîne, lazim bû ew wê gavê de li wê şeqemê bijîya, bigerîya... Bin baranê de, nav xûşîna baranê de, merov dixwaze ner derd û kûlên xwe bîrbibe!. Ax!

Wê demê de, ro, merov û qûrtîn; şev, tarî, bêdengî û xof hakîmê bajarê Diyarbekirê bûn: Pîyê êvarê pale ji kargehan û işxanan derdiketin, dişûn qehwexanan, an jî malen xwe. Gava paydosa kargehan xebatker û çerçîyen bazaran jî ji şûxûl dienirîn. Gava mixûrbe diket erdê, esnafan dûkanen xwe kîp dikirin û zûka diçûn malen xwe, ta zelalbûna sibê ji xanîyen xwe dernediketin... Saetekî-dû seatan du şîvê re, qehwexane jî dihatin girtin... Edî dewra kerhesiyê û xofê dihatin. Şevê carcara şe-

dihatin girtin... Edî dewra kerhesiyê û xofê dihatin. Şevê carcara şe-

Merov çi bike? Dinê bi dore û bajare Diyarbekirê kevne, xwadiyê van edetanân, ên ku nakîmê herkesine! Mesela diz dikarî şevê dûkanekê talan bike, lê sibê lazime ew hêre mijgeftê; zabît alîyekî segman ûkûtan, alîyê din digotin: "Qîymeta merovan bizanin." Tacîr-vira: "Pere her derî vedike, her tiştî dikare bikire.", wê derê: "Ez mu'mînim." Mela mizgeftê de pesn didan namûsê, lê gava ji mizgeftê derdiket, diçû ba jine-ke mîr. Va Diyarbekir bû, bajarekî din ne bû!. Ew tijî çirok û efsane bû.

18 Dengbêj dinalîya; dayîkê dilorand; birçitîyê û belangazîyê caddan de  
hesp dibezan. Ereba, Tırka, Kûrda, Ermenîya û Yahûdîyan mîzcyî hevdin  
dikirin. Papaz û keşîşan bi dizî zema melan û seyîdan dikirin; mela û  
seyîdan eşkere di diji keşîş û zindiqan de galegal dikirin. Kîjanî ji  
wanan rast qise dikir? Ne xûya bû! İxtîmal her dû alî jî bê heq bûn...  
Rustemê Zal demekê di van şeqeman de gerî bû. Bi gotina pîrek çîrok  
van, Kerem û Asli jî carekê ber derê vê "Kerwansaraya Mezin" dê raste  
hev hatibûn; ew ana hevdûra kenîyabûn...

-Apo, gelô vî zêrî jî bistînim, an na?

"Apo" bi kîlta îngiliz, derîyê a dûkan a mûcewheretvan vekirî bû; lê  
nikarî bû derîyê dûdîyan û ê paşîyê vebike; xwesti bû ku wî bêdeng bi  
firîne lê ew jî nebûbû. Bi alikariya kîreke mezin û tûj orta wî derî  
qelaşt; ê ku darinî bû. Kûneke gir vekirî bû... Lê dîsan jî çi heyf ku  
Apo nikarî bû bi xwe têkeve hûndirê dûkanê: Beden û laşê wî zêde ga-  
lind û firen bû. Bona wê yêkê, wî Memo di qûlê re derbaz kîrî bû...

Niha Memo di hûndir dûkanê de tiştên barsivik û biha û bi qiyimet  
berhev dikir... Apo ber dêrî dipûnijî (difikirî): "Va dizîya çak ne bû,  
jiber ku ez neketim hûndir û lawik jî li vire bisokinîya, minê bikarî-  
bûyagliş zêr kombikira..."

Ew çel, Memo hîft salî bû. Berî salekê rast hev hatibûn: Sibekê li  
meydanekê çar-pênc zarokan dora Memo girtî bûn û dest bi lêxistina wî  
kiribûn. Sebep? Wî dixwest tev wan top bilize... Orta geleçê de xafil-  
de Apo derket, bê deng Memo nelmêz kir û bire oda xwe. Ji wê gavê vir-  
da, herdu tim li cem hev man. Herdu jî bê bav, bê dê û bê malbatbûn.  
Ne hevalê çak û ne jî dostêñ xwe hebûn. Berê Memo geh bi parse, geh  
bi iş idare kîrî bû, niha bi tevayî ketibû bin destêñ Apo û bûbû pê-  
yayê wî. Apo çawa digot, wî jî welê dikir. Edî zaroyêñ din ji wî di-  
tirsîn û tew deste wî nedidañ. Hinekan dixwestin bibin hevalê wî: Bo  
ku Apo ew diparastin. Va Apo bû, ne merovekiñ din bû!... Apo dizekî  
dengdayî bû; bi gotinan kîmanî deh şalan di girtîgenê (hepisxane) de  
mâbû. Fêlbaz, xwînsar, zâlim bû... An jî ew welê nebû, lê navê xwe wer  
derketî bû: Wî ji gelecan û danhevân nefret dikir, dûr direvî. Lê ger  
ewa biketa nav şerekî, mûnêqek xwîn dinate rijandin. Tim du kîr û ses-  
arek pişta wî de bû. Wî re hinekan "Apo", hinekan jî "Reis" digotin.  
Navêñ xwe ên din "Xwînrêj" û "qeytanê kûr" bûn.

Kesekî saiê rînd ne dizanîn. Carê şêni (cemîyetê) ewa afaroz kiri-  
bûn, edî pewîst bû, ew tim qanûnan re bitêkoşe (mucadele bike).

Çiqas zêr hene, giştikan kom bike. Dolap û çekmecan vekê. Ew tijî  
zêrin... qaş mebe. Metirse. Ez li virâme...

Wî dixwes Memo bike dizekî anac. Carcaran şîret lê dikirin, şert û şirûten diziye pê re dikot û dinêtirandin. Merû va ne dikarî têbighên (fembike) gelo ewna nerdu dostin an na? Bi texmînan, wan jî ne dizanîn. Hevgirtinek ecêp û mezin nava wan de hebû.

Apo rind li ser şêmûga derîyê pêşiyê bû, ê ku nîv vekirî bû. Tenê carcaran baranê devrûyên wî dixist.

Baranê zêde kir. Brûskê têva da; xafilda, nişkava rûnayîyeke mezin karket. Simêlekî giri tilxir li ber poz bû. Bê riş bû. Hûyê rastê de rêça birînekî dirêjî kûr hebû. Pozê wî zêde pan bû. Enî teng bû. Bin şewqekî kevn de porêngewr û kurt xayî dikir. Bejnecî dirêjî: qalind nav ceket, kurtik û pantolun de bû... Qûrtîna éwran hat. Tariyê dîsan her dor zeft kirin. Bona diziye va şevêk çak bû: Bin baranê de polîs û payer tew nagerin...

Dilê wî ciğarek dixwest; lê têdbîr lazim bû. Difikirî: Nîvê emrê wî û pir derbas bûbû. Kaltî bergen de (ufuk) xayî bûbû. Ta îro tim nav qilêri û qevçiliya cemîyetê de, nav tarîyê de xebitî bû; qet tiştek dest neketî bû. Mana emrê wâna çibû? Pir caran, biryar (qerar) dida; ji dizîyê ênirî (xeyidî, qarî) bû... Kargeh û imalatxanan de li karekî digerî lê gava Karbidestan (memuran) mîzeyî cûzdanê wî dikirin, kar nedidan wî. Wî şond dxwar;" Min bawer bikin, ez êdî merîyekî rindim. Naxwazim dişiyê bikim... Ez peran naxwazim. Tenê cîyekî raketenê û nan. Soz, ezê ji palê (karker) din zêdetir bixebitim..." Karbidestan kin dibirin: "Kar nîye".

#### Hêdîka kûxiya:

- Lez meke, Mémik... Gişt zêran top bike...

- Kwînsarı û bêxof, yek; xebat û intizam dûdu; Bêbawerî û...

- Kûro, tu ci qisan diki?

Dengê kenê Memo nat!

- Fêlbazi, sisê...

"Apo" dixwest zûda iş xilas bike û bi silametî ji vê şeqemê (sokak) derkeve. Dilê wî de giranîyek pêda bû. Wî jî ne dizanî çima?.. Lê ne dixwest vê lêwik re bêje û wî bitirsîne. Bi destê xwe ê rastê ew dilxwesi ne dizanî ci bike. Va ne carâ yeka bû: Ta niha gellek caran A-

lopêñ baranê paqij kirin, ên ku ser enîya wî kom bû bû n.

#### Hêdîka şiret kir:

- Dema û dora galegalan nine...

Memo guh nedî gotina wî; mina nav lîstikeke xweşî delal de bû, ji dilxwesi ne dizanî ci bike. Va ne carâ yeka bû: Ta niha gellek caran A-

po re xebitî bû, tirs û ecemîtiya wî wende bûbûn:

Vana şertîn serketinêne (muvaafaqiyet), şorêñ tene... Tara, tara,

20

tîtîra!... Apo, min bazinekî bênenî bedew dît. Ger daka min hebûya, minê ev pêşkeşî wê bikira. Tara! tara! çi delal! bi resmên gulan hatî-ye neqîşandin. Ox, kêrekî zêr... Apo, tu êdî wan kérén xwe bavê. Ewana bêbina û bê qiyemetin... Vê bigre... Hû? Mêzike, va çiqas zexm û rinde! Tê dît, an na?

— Ez benî, ez derva me, tu nundirdayî, çawa ez dikarim, bibînim...  
Zû bike!

Memo kêra zêrîn qûla dêrira dirêjî Apo kir:

— Hin! Hin! Bistîne, ...

Apo kêr girt, kir berîya xwe. Serê xwe hejand. Ji zarotîya Memo xeyîdî bû. Ger şûna Memo de xortek, an jî kalek bûya, wî niha zûdava şorênen bê mûnasip gotîbûna... Zarotî û sexitîya Memo dest û piyêñ wî girêdabûn... Aliyekî dilê xwe de difikirî. "XXXXXXDivê min va lawkê sexî belengaz ne kiribûya nav van işen xwe ên qevçî!..." Aliyê din got:

— Mémik, bi lezbe...

— Deqekî pêsta, te got, lez ne pêwîste...

Apo tifî erdê kir, simêla xwe bada. Şesara xwe derxist.

— Niha pêwîste!

— Hêj sibe dûre... Baran jî dibarê... Peyîze, Va dûkana çi germe.... Welle, min dixwest vira razêm... Çi kûrsîkî çak... Divê, em van kûrsîyan jî bibin... Oda me de kûrsî nîye... Tenê qatek cil heye... Van odayêñ xelkê çiqas rindin... Heylo hayê... Tara, tara...

Apo ji van şor û nenekîn Memo zenf şaş û mat bû. Va cara pêsin bû, dora dizîyê de Memo dikenîya û nenek dikir: "Va şeytane, çiye? Eynî ka diwê dolê şeytine... Sexîye... Meslegê min dizîye, bona wê yekê, min ew kir diz... Tu!... Heyret, bona vê xwîsarîyê; heyret... Ecêp? Ecêp kîdîn nebûbe... Ji tırsan? Na bavo, tenê zaroye, têndîgnîye... Kûrike? Em nê di sî-nêmedane, dizîyê dikine... Yarebbî tu me biparêze... Yarebbî komekîyê bide me..."

Memo dest bi lorandinê kir:

Ax, heylo! Bavo, heylo hayê!...

Wî welatî sebra min nayê...

Wî welatê ninekî bê derd

Digerim, ê ku tijîye rez

Ü portagal, dostî û çerez!

Ax, heylo dayê, neylo dayê!

Va kilamekî kevnî meşûrî bedew bû. Denga Memo jî zehf xwes bû.

Tewata Apo hate birîn, şûna xwe de livîya, livîya. Wî edeta neşen xwe ûnda kir. Hezar carî pûşman bûbû ku tev Memo hatî bû..." Qûsur, qûsura nine... Çima an tenê, an jî tev camîrekî din natim...

Na tênebûn rind nine... Lê divê tev zilamekî... Yarebbî alikarîya xwe  
ji me negre." 21

- Kuro Memik, tu dîn bûye ?

- Çima Apo ?

- Tu ! Çer çima... Kûçik... Ax,na na... Kûro,ez gorî,va zeman û şü-na kilam û evînê nine... Wexta îsta,merov cawa dikare bistirêne ?..

— Çima nikarı ?

Hember wê pirsê de Apo laj bû. Xwîyek sar li ser enîva kom bû.

Memo dirêj kir:

- Dema ez ba terzî dixebitîm, ewana him dixebitîn, him jî kilam di-gotin... Dawî, ox... Her tişt xelas bû... deqîqekî din rê bide, kerem bi-ke... Belê... dayê... Qet zêr û zîv nomâ... Min giştik paqij kir... Tûrê min geleki girane na... Sê-çar kîlo hene... hûn... Tûr bigre... Tu dil-xwes bûyî , Apo ?

Apo nefesek dirêj kisand; riwêla xwe kire berîya xwe... .

Hele şûkir ! şûkir !

Wî destê Memo girt û Qûla dêri re derxist. Tûr kire bin pîyê xwe ê rastê, deriyê pêşîn girt; kilit kir û kete rê, dilê xwe de:" Van zêr û zîvana dikarin min û Memo vê zivistanê idare bikin... Towe, ta biharê, ta dawîya vana tê diziyê nakim. Xwedê tu şahîdê minî... Soz.. Ezê Memo bidim ber xwendinê... hi... Nabe... Çima nâbe ? Zarokî paqije... Bire ji feqîrî û diziyê xilas bibe ... Emrê çûrt bû, rizîya... Bire ê wî ne- rize... Him destmiza wî jî di vê diziyê de heye..."

Ber dîwaran de ner dû bin beranê de dilerizîn. Oda wan gellekî  
dûr bû, taxekî feqîr de bû...

bû, taxeki fedir de bû...  
yafilda kosê seqemek piçük de sê dengê işk û sert bilind bû:

Xafilda, koşê şeqenek piçük de se aenge işk a serî  
- Melivin !.. Emê we bikûjinI Destên xwe bilind bikin... Devê sê  
riwêlan rind ketin nerdû kâlekên Apo ku wî xwînsarîya xwe qet weda ne-  
kir. Tûrê tijî mûcewherat jî di destên wî de şeqitî û kete erdê. Memo  
mat bû; nav lingên qeletûyan de sekînî bû. Destên xwe hêjadin, dixwest  
tiştekî bêje, lê zimanê wî negerîya. Devê xwe vekir, lêvên xwe livîyan;  
hewênen baranê ketin devê wî. Van hemû tiştana di nava bîstekê de  
derbas bûbûn...

Apo:

hün kine ?

Apo:  
- nûn kîne ?  
Di vê zûlmetê de serçav û sersekeyên kesî nedinat naskirin: Tenê  
deng û nereket... Nav xûşîna baranê du galegalên wînan pir bêtoşe bûn...  
Gava Memo bênesî destê yekî girt, şelmaqekî giran li rûyê wî ê rastê  
ket.

Apo:

Hûn hevalên wî lawikîne? Eybe, hûn çîma dikûtin?.. Hûn kîne?

Dengekî:

Em merovê ji te pêttir û fîlbaztirin.

Apo:

Hûn dizunin ez kîne?

Dengekî din:

Belê... Tu jî dizekî mîna meyi. Te li dûkanek piçûk mûcewharat aizî, emê jî li te bistînin.

Nînayet ji qirika Memo, yek bi yek şûr derketin:

Vana zêrê minin... Zêrê minin vana... Deste Apo medin... Welle bille min dizin... Min dûkan şêland...

Dengê şelmaq, gûrmizk û pînan ketin nav nalînên lêwik, ê ku vetevijî û kete erdê...

Apo:

Gelo nûn tew merov ninin?

"Em merovê ji te zexmtir û pêttirin":

Ger polîs merove, em jî merovin...

Dengê pînan dom dikir, lawik diqîjiya...

Apo:

Insafa we qet tunneye?

"Belê"

Insafer çiye?.. Insafer bona belengazan zerar, bona dewlemendan kare, qezence...

Apo:

Va dema dema Meye. Lî dora û dema miñ jî ê were.

Dengê belê:

Dora te ne, lê songîya te hat.

Qameke qalindî dirêj ta binî kete nav dil û kezewên Apo, ê ku mîna qewaxan li ser piştê ket... Dengê bazdana sê çift lingan li ser kevirê şeqemê de bilind bûn, dûrkétin, sist û ünda bûn.

Memo hêdî hêdî rabû ser çôkên xwe, nêzîka bedena Apo bû. Bê deng destê xwe ser devrûyê wî de gerandin; tiliyê wî dilerzîyan. Hüstîyê Apo tiji tiştekî germî nerî bû. Xafilda brûskekê yeda; ronakî kartet. Ji sîngê Apo xwîn nola ava kanîyêñ biharê dinêrikî, diçû, dikctin ser kevirê şeqemê... Çavêñ Apo vekirî mabûn; te digot, ew ka sarkalm û zelûlî tijî bûbû. Ronakî hat qedandin.

Memo berê destê xwe ê rastê hêjad; hêjand. Hemû çekêñ wî rind şil bû bûn. Av ketî bû ser çermê wî... Paşê bûl bû, serê xwe kir nav sîngê Apo ê bi xwîn:

Tariya şevê de, baranê tavçn xwe zêdetir dikir û nişka dibarî. Der-va sar bû. Peyîzê kurmê xwe û paşin dirijand. Qurtîna baranê zêde bû bû. Merov digot, ka ew dera çol bû.

- Hawar<sup>I</sup>. Çirrî û gazi<sup>I</sup> Merovek kuştin<sup>I</sup>. İmdat<sup>I</sup> Merove çakî mîrxasî rind kuştin<sup>I</sup>. Werin<sup>I</sup>.

Şeqemeke Dîyarbekirê de xwîn tev avê dinêrikîn. Hemû deri û pence-kîp û girtî bûn. Lawikek nava şekemekî de ser meyitekî bû... Tarî bû...

M e h m e t B O R

H O X O R T

I

Ho xort !  
Xortê Kurd,  
Pêşengê xebat,  
Hêvîya welat,  
Kurrê bav û dê  
Ji bo azadî,  
Ji bo serbestî,  
Bi şev û bi roj,  
Me divê xebat.  
Neval û hevre  
Azadî, bi dûrketinê..  
Berî her tiştî,  
Ji her ramanek,  
Ku me bi dûrxe,  
Ji armanca me.  
Heya em navê,  
Ramanê cankuj  
Di nav serên xwe,  
Çawân sar dibe,  
Ev tivanca me.  
din ji me,  
Bawerîn ku,  
Azadiya welêt,  
Ji neyaran,  
Ji zorkeran,  
Ewe serxwebûn.  
A rast,  
Çi ramanek kevn  
Çi ramanek nû,  
Ku me girêde,  
Me dike kolî,  
Ew e winda bûn.  
Divê em,  
Berî her tiştî,  
Bi nênrîna xwe,  
Bi ramana xwe,  
Aza bin serbest.  
Çiqas em,  
Bêne girêdan,  
Bi ramanê xelkê,

II

Li ser riya wan,  
Dê bibin bindest.  
Bo çi tu ?  
Xwe qels dibînî,  
Kêmtirî xelkî,  
Dûvik û terî,  
Şermende,  
neben û bêkîr.  
Çi roja,  
Ku bûye şerr,  
Ku bûye ceng,  
Tu dibû serdar,  
Tu bû nijdevan,  
her tu bû piştîmîr.  
Ji bo çi ?  
Tu bîkî,  
Xelk bixwe,  
her ji keda xwe,  
Bimînî bêparı..  
Ji dilpakî,  
Bi dilqencî,  
Beyî xapandin,  
Bîm îni li pas,  
Xulamê neyâr.  
Bese, Ho,  
Çavê xwe veke,  
Da ku carek din,  
weki her carê,-  
Neyî xapandin.  
Baş binas,  
Riya xwe,  
Anmanca millât,  
Da giyanê Kurd  
Bête vejandin.  
Azadî,  
Ji bo te  
Ku bi tukesî,  
Bi tû ramanan,  
Neyî girêdan.  
Yekarmanc,

III

Yek rézan,  
Yek raman,  
Xebatê bîkî,  
Ji bo Kurdistan.  
Ji bo îro,  
Ev gotin besin,  
Heke zanibî,  
Ji min bibhîse,  
Şîreta biran.  
An na,  
Dê bê xapandin,  
Ji dilpaqijî,  
Bibî part ji bo,  
Rovî û Gurân.

Osman S E B R I  
(Kitêba BAHÖZ rûpel 67)

T E D A Y I

Rûpel

NivîskarNivîsar

Şoreşa Kurd û Daxwaza		I-2
Awtonomî bo Kurdistana		
Nîvro (Iraqê)	SORO	2-4
Kurdistan û Serxwebûn	REŞO	4-6
Serpêhatî	DERKETÎ	
Kronolojîya Nivîskarê		
Kurd li Kurdistana		6-7
Bakur	REŞO	
Rojî Resî Şeşî	Pîremerdî	7-8
Eylul	(Bi pênuşa K. Fuad)	
Be Derbederî	HÊJAR (Bi pênuşa K. FUAD)	8
Şewaş ji Xwedê	REŞO	8-9
Marşa Xortê Kurda	M. BOR	9
Newroz	M. BOR	10
Xwarok	REŞO	11
Wefda Kurdi	O. SEBRÎ	I2-I5
Axa Welat	REŞO	I5-I6
Hosîya Min	M. BOR	I6-I7
Çîrok	M. BOR	I7-23
Ho Xort	O. SEBRÎ	23

PîROZI

Malbata kovara " Hêviya Welêt", XXX Cêjna we a NEWROZ pîroz  
dike û di xebata welatî de jî XX serbilindî, xweşî û serketinê dixwe-  
ze!

TIKA (rica)

Em karkirêن " Hêviya Welêt" li xwendevanên xwe tika û hêvi  
dikin ku bi nivîsarêن xwe alîkariya me bikin. Hûn dikarin bi hemû  
zimanen û bi gişt zaravayêن kurdi binivîsinin. Emê ên ku bi zimanen  
beyanî natine nivîsin wergerînin Kurdi û belav bikin.